Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1305 | 7-Îlon-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Zimanê Suryanî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji nû ve zindî dibe

**Dilîn Ehmed/Qamişlo**

**Saziya "Olf Taw" ji destpêka damezirandina xwe ve ji beriya deh salan ve, di parastina yek ji zimanên herî kevin ên cîhanê, zimanê Suryanî de didomîne û li herêmên cuda yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî nifşên nû fêr dike. Da ku ev zimanê kevnar di jiyana rojane û çanda herêmî de bimîne.**

Di demeke ku cîhanê di nava gelek aloziyan re derbas dibe û zimanê gelê yê ber bi qirkirinê ve diçe, yek jê zimanê Suryanî ye, sala 2014`an li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo têkbirina qirkirina zimanê gelê lewra ziman nasnameya civakê ye, saziya Olf Taw dest bi erkê parastina zimanê Suryanî dike. Ji ber ku zimanê Suryanî yek ji zimanên herî kevin ên cîhanê ye, parastina wê û fêrkirina nifşên nû, pir girîng û pêwîst e.

Li ser vê mijarê Rêveberiya Saziya Olf Taw ya şaxê bajarê Qamişlo Cozfîn Somî ji rojnameya me re axivî û diyar kir ku, xebatên saziyê ji fikira perwerdeya derbas dibe, ew bûye projeyeke şaristanî ku di serî de vejandina zimanekî kevnar ku bi dîrok û çanda gelên herêmê bi hezaran salan ve girêdayî ye, zindî dibe.

Rêvebera saziya Olf Taw Cozfîn Somî wiha axaftina xwe berdewam kir: "Saziya Olf Taw cara yekem di sala 2014 'an de li Qabrî Hiyûrî ava bû, piştre jî me di sala 2016'an de şaxê Qamişlo vekir. Îro çar şaxên me yên sereke li Hesekê, Qebrî Hiyûrî, Dêrik û Qamişlo hene. Ji destpêka damezirandina me ve armanca me zelal, parastina zimanê Suryanî û fêrkirina



wê ji nifşên nû re ye. Lewra zimanekî pir kevnare û beşek ji beşên herî girîng yê nasnameya vê xakê ye."

**Armanca saziyê û rola wê**

Cozfîn girîngiya vî zimanê kevnar bi van gotinan rave dike: "Suryanî ne tenê zimanek e, ew şaristaniya ku bi hezarên salan dirêj dike. Koka wê vedigere hezarsala ya beriya zayînê û ew jî dirêjkirina du zimana ye AL-Ekadî û Aramî ye. Ev ziman di dema xwe de zimanê zanist, raman û wêjeyê bû. Li seranserê Şam û Mezopotamyayê belav bû heta digihîje Misrê. Îro jî em şopên wê di pirtûkên kevnar, sirûdên ekolojîk û navên ku îro jî hene dibînin. Di zimanê Suryanî de 22 tîp hene 28 jê yên dengdarin. Ev ziman heta roja îro jî li dêrên Rojhilat weke zimanekî bingehîn tê bikaranîn. Di heman demê de xwedî zaravayên cuda ye, ya herî girîng jî zaravaya ya Tûr Abdîn yê Rojava û zaravayê Sûrz Rojhilat e ku ji aliyê gelê Xabûr ve tê axaftin."

**Ne tenê Suryan Kurd û Ereb jî fêr dibin**

Cozfîn diyar kir ku sazî ji bo pêkanîna armanca xwe li ser gelek erkan dixebite û wiha pê de diçe: "Karê me yê sereke amadekirina kadroyên perwerdeyê yên ku bikaribin zimanê Suryanî li dibistanên taybet û dibistanên Rêveberiya Xweser bi awayekî rast perwerde didin. Em ne tenê Suryaniyan lê belê em di nav de Ereb û Kurd jî hînî ziman dikim. Ji ber ku em di wê baweriyê de ne ku hevjiyana rasteqîne bi têgihiştina ziman û çanda gelê din dest pê dike. Herwiha ji bilî perwerdeya dibistanê, em li ser amadekirina mînhacekî nûjen, nivîskarî, dîzaynkirin û çapkirina pirtûkan dixebitin. Armanca me ew e ku em bi rêbazên perwerdeyê yên nûjen berê xwe bidin serdemê, da ku Suryanî bi awayekî xurt di mînhacê perwerdeyê de cih bigire. Me minhacê xwe bi temamî yê bi zimanê Suryanî amade kiriye."

**Çalakî û dewreyên perwerdeyê**

Cozfîn Somî destnîşan dike ku xebatên saziyê tenê bi dibistanan re sînordar namîne, lê bernameyên cuda yên perwerde û hînkirinê jî hene. Cozfîn wiha got; "Ji bo amadekirina mamosteyan peymangehê me hene ta ku bi awayekî serkeftî derbasî dibistanan bibin. Her wiha em dewreyên perwerdeyê ji bo mirovê bi temen mezin jî yê ku dixwazin zimanê Suryanî fêr bibin, pêşkêş dikin. Em çalakiyên havînê jî ji zarokan lidar dixin, ji wan 3 dewreyên rojane pêk tên. Ya yekemîn ji bo zimanê Suryanî, ya duyemîn hesabkirina derûnî yan jî fêrbûna zimanekî din, ya dawî jî fêrkirina wan ya li ser stranbêjiyê û folklora Suryanî ye. Em xwe bi xebatên havînê ve sînordar nakin, em hefteyê carekê çalakiyeke li derve li dar dixin, wekî geştan li avjeniyê an jî serdana navendên ku zarokan jê dûdê bigirin em li dar dixin. Armanca van çalakiyan hînbûnê û keyfxweş zarokan ne ku di hawirdoreke hevbandorî û çandê ve dewlemend bibe. "

**Sîstema perwerdeyê ku di dibistanan de hatiye pejirandin**

Derbarê sîstema perwerdeyê ku li dibistanan de hatiye pejirandin Cozfîn Somî wiha dibêje: "Di dibistanên Rêveberiya Xweser de xwendekar di sê salên destpêkê de bi zimanê xwe yê dayikê fêr dibin, paşê ji refa çaremîn ji bilî zimanên sereke zimanekî din hildibijêre yan Suryanî, Kurdî û Erebî, ev sîstem têgihîştin û jiyana hevbeş ya di nava gelên de di mejiyê zarokan de wekheviyê dide avakirin. Armanca me jî ev e em karê saziyê ne weke projeyeke demkurt e, lê belê ji bo parastina mîrasa çandî planeke berdewam e. Em bi berdewamî li ser pêşxistina mînhac ya ji bo hemû qonaxan, ji seretayî heta navîn, û em rêbazên nûjen dipejirînin ku li gorî pêdiviyên nifşê nû be ta ku zimanê Suryanî zindî bimîne. Ji ber ku ne tenê zimanê pêkhateyekê ye, lê belê ew dîrokeke ku divê di pêşerojê de wekî pira jiyana bi hev re bimîne.

Rêvebera saziya Olf Taw Cozfîn Som wiha axaftina xwe bidawî kir: "Em di wê baweriyê de ne ku dema mirov hînî zimankî din dibe û dîroka wê nas dike, rêzê jê re digirin. Ji ber vê yekê, em dixebitin ku Suryanî bibe zimanekî têkiliyan dinavbera gelan de. Peyama me ew e ku em vî zimanî vegerînin rewşa ku di civakeke pirçandî û dîrokî de cihê xwe bigire."

## Gotina Dawî



### " Rojava xeta min a Sor e"

**Mihemed Seydi**

Hertim dewleta Tirk Bakur û Rojhilatê Sûriyê tehdîd dike. Di hefteya derbasbûyî de li ser navê Wezareta Parastinê ya Tirk daxuyaniya gefxwarinê hat dayîn ku tê diyar dikin an QSD'ê xwe radestî Şamê ( HTŞ'ê ) bike an jî ew ê tevî wê li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê operasyonê bidin destpêkirin. Ev tehdîd û gefên dewleta Tirk ne nû ne û ne jî cûda ne ji yên berê. Wê ji destpêka şoreşa Rojava de gef li Kurdan dixwar û carne digot ew ê wan ji sînor paqij bike û carne jî digot ew ê Kurdan binax bike. Ev gotin jî li ser dezgehên çapemeniyê bi eşkereyî dihatin kirin. An serokkomarê Tirk Erdogan an wezîrê karê derve an jî li ser navê partiya desthilat ev gef dihatin xwarin. Ji xwe êrişa destpêkê ku li ser Rojava hat kirin di sala 2012'an de li ser Serêkaniyê bi destê heman koma ku niha li Şamê desthilate bû. Wê demê Cebhet El-Nusra bû û paşê bû HTŞ û niha jî jêre dibêjin Dewlet. Serokê wê jî Ebû Mihemed El-Colanî bû û paşê Kincên wî guhertin û Ehmed El-Şeria derxistin hole.

Li aliyekî dewleta Tirk dibêje ku QSD'ê peymana 10'ê Adarê ya bi Şamê re pêk nayîne û li aliyê din Şamê li hember Kurdan sor dike û zextê lê dike da Bakur û Rojhilatê Sûriyê û saziyên wê red bike û nasnameya wê qebûl neke. Li aliyekî rayedarên wê derdikevin û dibêjin ew bi Kurdan re dixwazin aştiyê pêkbînin û li aliyê din bi hîlebaziyan dixwazin Kurdan bê parastin bihêlin da wekî li Siwêdayê û Beravê komkujî derheqê Elewî û Durziyan pêk hatin, li hember Kurdan jî dîsa pêk bînin.

Lê daxuyaniya ku ji endama Heyîeta Îmraliyê Pervîn Buldan derket, bersiva dewleta Tirk bi eşkere da. Buldan eşkere kir ku Abdullah Ocalan careke din gotiye ku Rojava û Sûriyê ji bo wî xetên sor in. Vê daxuyaniyê bandoreke wê ya zêde hebû. Ji ber rayedarên dewleta Tirk her carê dixwastin bibêjin ku Abdullah Ocalan gotiye bila Kurd li Rojava çekan deyînin û entegreyî dewletê bibin, ev daxuyanî bersiveke zelal bû. Dîsa ji bo Rojava û hêza wê QSD'ê jî zelal bû di mijara çekên di destê xwe de wê tu tawîzan di vê derbarê de nede. Lewra endamê desteya rêveber a PYD'ê Salih Mislim bombeyeke Siyasî teqand û got ku an bi Şamê re li ser Nenavendîbûnê li hev bikin an jî ew ê serxwebûna xwe bixwazin. Yanî tu carî wê Kurd sîstema ku dewleta Tirk li ser îsrar dike ango dewelta navendî qebûl nekin. Dixwazim bibêjim, ya ku Kurd eşkere raber dikin û ji hemû aliyan re bi zelalî tînin ziman ew e; Mijara parastinê û çekan xetên sorin, ji ber ew misogeriya pêşîlêgirtina komkujiyan e û ew ne xalên nîqaşê ne. Dîsa yê ku dixwaze bi Kurdan re li hev were û aştiyê pêk bîne, bila serê Tifingê di bere nîşan nede. Kurd jî xwedî tifingin û di nava dengeyên nû de xwedî hebûnin û di qada navdewletî de jî ne bê hevalbendin.

### Sudoku:Pirs 56

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | 6 | 2 | | | 5 |
| 2 | | 9 | | | | | | 3 |
| 5 | | | 1 | | | | 9 | |
| | 5 | | 3 | 1 | | | | 4 |
| 8 | 1 | | | | | | 5 | 9 |
| 9 | | | | 8 | 4 | | 2 | |
| | 8 | | | | 6 | | | 7 |
| 4 | | | | | | 5 | | 2 |
| 1 | | | 7 | 9 | | | | |

### Sudoku: Bersiv 55

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | 8 | 5 | 3 | 1 | 9 | 2 | 6 | 7 |
| 2 | 9 | 3 | 7 | 5 | 6 | 1 | 8 | 4 |
| 1 | 6 | 7 | 8 | 2 | 4 | 3 | 9 | 5 |
| 9 | 4 | 8 | 2 | 6 | 7 | 5 | 1 | 3 |
| 3 | 1 | 2 | 5 | 9 | 8 | 7 | 4 | 6 |
| 5 | 7 | 6 | 1 | 4 | 3 | 9 | 2 | 8 |
| 7 | 3 | 4 | 9 | 8 | 2 | 6 | 5 | 1 |
| 6 | 5 | 9 | 4 | 7 | 1 | 8 | 3 | 2 |
| 8 | 2 | 1 | 6 | 3 | 5 | 4 | 7 | 9 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Kêmayî korayî:**
- Kesê lewaz û xizan be weke koran e.
**Ma di bin de:**
- Ji heq derneket; nikarî bike; neqedand; di nîvî de hişt.
**Nayê milê min:**
- Ez nikarim bikim; ji taqeta min der e.

**LI SER CERIBANDINÊ**

**Borê xwe qam kirin:**
- Karên xwe ceribandin; xwestin bizanin ka karê wan çawa diçe.
**Çûye bor qam bike:**
- Çû binêre ka wê bikare wê karî bik, yan na.
**Dewê ceribandî çêtir e ji mastê neceribandî:**
- Tişta ceribandî ya nebaş jî ji tişta baş ya neceribandî baştir e.
**Hilteqiland:**
- Xwest nas bike; xwest bizane ka xurt e, yan qels e.
**Li mêzînê xist:**
- Bi heman wateyê.
**Serê xwe veke, deng li bextê xweke:**
- Bi heman wateyê.

**LI SER HINDIKBÛNÊ**

**Dasek û dehlek:**
- Tişteke hindik e lê yên dixwazin pir in; têra her kesî nake.
**Gewriya wî pê şil nabe:**
- Pir hindik e.
**Gundek e gindorek e:**
- Tişteke hindik e lê yên dixwazin pir in; têra her kesî nake.
**Hindek e gundek e:**
- Bi heman wateyê.
**Ji bostan zebeşek jê re ket:**
- Tişteke pir hindik jê re ket; tişteke bêqîmet jê re ket.
**Ji rez wîşiyek jê re ket:**
- Bi heman wateyê.
**Ji serî guh:**
- Tişteke pir hindik.
**Sed çakûç û yek sidan:**
- Wê têra kê bike û têra kê neke; hindik e û pêwîstiya gelek kesî pê heye.
**Seriyek çortan e birek mêvan e:**
- Dema mirvo pir bin û pêwîstî kêm bin hingê tê gotin.
**Serîpepik:**
- Tişteke bêqîmet; tişteke pir hindik.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Fatma Atabay: Pêkanîna entegrasyona demokratîk erka me ye



Aktivîsta TJA Fatma Atabay diyar kir ku Rêberê Apo dibêje: "Di têkoşîna aştî û azadiyê de jin pêşeng in; ev ne tenê ronesansek e, lê avakirina civakeke nû ya civakî ye." Em jin jî bi hîskirina berpirsyariya jiyankirina vî ruhî, bi hêza kevneşopiyê û coşa siberojê xwe ji bo qonaxa nû ya têkoşînê amade dikin.**R-2**

## 'Xîtaba nefertê û zimanê dijber dê şerekî navxweyî bi xwe re bîne'



Endama Meclisa Sûriya Demokratîk MSD'ê Bêrîvan Hesen diyar kir ku li hemberî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê kampaniyên sîstematîk ji bo avakrina fitneyê di navbera pêkhateyan de çêbikin têne kirin û wiha got: "Gerek gel hişyar be ji ber ku xîtaba nefretê dê şerekî navxweyî bi xwe re bîne."**R-4**

Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1305 | 7-Îlon-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S



## 'Dewleta Tirk şerê avê dimeşîne'

Şêwirmendê lêkolînên av û ekolojiyayê Alaa Hibo da zanîn ku bi sedema şerê avê yê ku dewleta Tirk dimeşîne, herêm ber bi zuhabûnê ve diçe, rêjeya ava binerd daketiye 50 mitreyan û got, "Dewleta Tirk şerê avê dimeşîne û çareyên mayinde pêk nayên."**R-6**

# RÊVEBERIYA XWESER

## 7 SAL TÊKOŞÎN Û BERXWEDANEKE SERKEFTÎ

Rêveberiya Xweser A Bakur û Rojhilatê Sûriyê di nava 7 salan de bi kar û xebatên xwe yên xizmetguzarî, siyasî, dîplomasî, leşkerî û rêxistinî serkeftinên mezin qezenc kir, ji bo avakirina Sûriyeke nenavendî û pirreng bûye hêviya tevahî gelên Sûriyê.**R-3**





## Ji çiraxên wêjeya Kurdî

Helbestvan Ehmed ne tenê helbestvaneke neteweyî an jî zanyarekî olî bû, lê ew çemekî ji zanistê diherikî û çavkaniyek bû ji zanînê ku qet zuha nabe.**R-7**



## Sûc û hovîtî li Efrîna dagirkirî zêdetir dibin

Berpirsê Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Sûriyê Îbrahîm Şêxo diyar kir ku rewşa Efrînê ji berê xirabtir bûye û wiha got: "Kiryarên xirab li dijî şêniyan bi hemû awayan pêk tê, kesên vedgerin Efrînê îşkence li wan têne kirin û malên wan radestî wan nayên kirin."**R-5**



### Divê Şam gurmikên xwe li ber dahola Tirkiyê neleqîne!

Idrîs Henan R-5



### Xwedîkirina ruhê şoreşê

Remezan Olçen R-7

# Fatma Atabay: Pêkanîna entegrasyona demokratîk erka me ye

Aktivîsta TJA Fatma Atabay diyar kir ku Rêberê Apo dibêje: “Di têkoşîna aştî û azadiyê de jin pêşeng in; ev ne tenê ronesansek e, lê avakirina civakeke nû ya civakî ye.” Em jin jî bi hîskirina berpirsyariya jiyankirina vî ruhî, bi hêza kevneşopiyê û coşa siberojê xwe ji bo qonaxa nû ya têkoşînê amade dikin.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Derbarê kar û xebatên tevgerên jin li Bakurê Kurdistanê di çarçoveya pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk de, aktivîsta TJA Fatma Atabay bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Bi banga aştî û civaka demokratîk re kar û xebatên Tevgera Jinên Azad di çi astê de tê meşandin?**

Ruhê demê yê nû bi xebatên avakirinê armanc dike. Pêşengiya ku bi konferansê dest pê kir, bi banga aştî û civaka demokratîk, bi mîsyona pêşengiyê ya ku Rêberê Gelê Kurd ji bo jinan destnîşan kiriye, di gelek qadên jiyanê de bi xebatên xwe roleke pêşeng digire. Rêberê Gelan ev yek wiha îfade kiriye: “Di têkoşîna aştî û azadiyê de jin pêşeng in; ev ne tenê ronesansek e, lê avakirina civakeke nû ya civakî ye.” Tevgera jinan di vê pêvajoyê de bi xebatên bingehîn, lê bi armanca ku tevahiya civakê bigre nav xwe, planek amade kiriye. Herwiha ji bo em li hemberî siyaseta şer banga aştiya civakî bikin, li dijî polîtîkayên qirkirina jinan, destavêtina zarokan, qirkirina xwezayê, polîtîkayên qeyûman û asîmîlasyona qirkirinê, gelek çalakî, bûyer û xebatên hişyarkirinê dimeşînin. Di hin bajarên girîng de jî meş hatin lidarxistin. Di heman demê de bi dirûşmeya civaka demokratîk, li bajar, tax û gundan civînên gel û serdanên malbatan hatin kirin. Bi konferansê re, xebatên komun û meclisan didomin. Di hin bajaran de ev yek hatine ragihandin, lê di bajarên din de zemînên wan tên amadekirin. Bêguman, ev xebat jî xebateke demdirêj e.

Di 10 salên dawî de, bandora polîtîkayên şerê taybet ên li ser gelê Kurd pir zêde ye. Gel ji rewşa ramana saxlem a ji bo têkoşînê dûr ketiye, aborî ji bo wan bûye mijareke bingehîn û gel bi xizaniyê re rû bi rû ye. Bûtçeya gel ji bo şer tê xerckirin. Ji ber vê yekê, ev yek weke pirsgirêkeke bingehîn li pêşiya me ye. Em plan dikin ku di pêvajoya bê de van pirsgirêkan bi afirandina qadên nû yên aborî derbas bikin.

**Wek tevgera Jin li Bakurê Kurdistanê gelek kar û xebat daye meşandin ev xebat di kîjan çaroveyê de tê meşandin û encamê wê çawa ne?**

Xebatên Komîsyona Hiqûqê di çarçoveya Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk de, Komîsyona Lêkolînê ya Jin û Hiqûqê ji bo piştgirîkirina xebatên Komîsyona Destûra Bingehîn hate avakirin. Ev xebat li Tirkiye û Kurdistanê didomin. Komîsyona Jin û Hiqûqê di 24’ê Tebaxê de ev yek bi fermî ragihand. Ev xebat bangewaziyek e ji bo hemû pêkhateyên jinan û rêxistinên civaka sivîl. Komîsyon wê li her bajarî civînên jinan lidar bixe, daxwazên jinan guhdarî bike û van daxwazan bi awayekî madeyî rêz bike, da ku destê Komîsyona Destûra Bingehîn xurt bike. Di salên dawî de, jinên ku ji bo azadiya fizîkî ya Rêberê Gelan têdikoşin, di vê pêvajoyê de jî têkoşîna xwe didomînin. Rêberê Gelan wiha gotiye: “Azadiya min bi azadiya civakê re têkildar e, bi serê xwe nayê nirxandin.” Em jin jî, li gorî nexşerêya ku wî destnîşan kiriye û çareseriyên ku wî pêşkêş kirine, bi jinan re dicivin, van argûmanan fêm dikin û wate didinê. Di pêvajoya bê de, ji bo azadiya fizîkî ya Rêber Apo, em plan dikin ku meşeke din jî li meşên xwe zêde bikin. Bi kurtasî, ji bo aştî û aramiya civakê, em çalakiyan li dar dixin, da ku Serokê Muzakereyê Rêber Abdullah Ocalan zûtirîn azadiya xwe ya fizîkî bi dest bixe. Eger zemin guncaw be, em dikarin gavên mezintir ên ku guhertin û veguhertineke civakî ya mezin bi xwe re bîne, bavêjin.

**Rêber Apo dibêje yê ku herî zêde xwedî li pêvajoyê derkeve û rol bilîze jin be, ji bo wê erk û berpirsyartiya ku dikeve ser milê jin, da ku ji pêvajoyê re bibe bersiv çi ye?**

Em jin di pêvajoya bê de, di çarçoveya kampanyayekê de, ji bo hevdîtina bi Rêber Abdullah Ocalan re û nîqaşkirina pêvajoyê, xebatan dimeşînin ku serlêdanê ji Wezareta Dadê re bikin.



Di Manîfestoya Civaka Demokratîk a ku Rêber Abdullah Ocalan di demên dawî de pêşxistiye, gelek têgîn û pênase hene ku pir girîng in û divê bêne fêmkirin û ravekirin. Çima guhertin û veguhertin hewce ye, mijarên weke entegrasyona demokratîk weke erk li pêşiya me ne. Tevgera Azadiya Jinan, bi çanda berxwedanê ya mezin, ruh û hişmendiyeke nû afirandiye. Bi hîskirina berpirsyariya jiyankirina vê ruhê, em bi hêza kevneşopiyê û coşa pêşerojê xwe ji bo qonaxa nû ya têkoşînê amade dikin. Bêyî ku em nirxên dîroka berxwedana xwe ji bîr bikin, em ê wan mezin bikin, bi ruh û hişmendiya azadiyê kûr bikin û weke pêşengên civakê bidomînin.


# Di Şerê Gelê Şoreşgerî de; jin pêşeng e

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

**Endama Meclisa Jin a PYD’ê Wehîda Xelîl destnîşan kir ku beşdarbûna jinê di Şerê Gelê Şoreşgerî de ne bi sînore û wiha got: “Şerê Gelê Şoreşgerî yê ku tê meşandin û encamên ku derketine holê, îsbat kirin ku jin bi vîn, hebûn û rêxistina xwe dikare xwe û civakê tevahî biparêze.”**

Gelê herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê di destpêka şoreşa Rojava de bi hevre ketin nava kar û xebatê û bi hev re parastina herêmê kirin. Her wiha di şerê li hemberî çeteyên DAIŞ’ê û dagirkeriya Tirk û çeteyên girêdayî wê. Ev têkoşîn û berxwedan di çarçoveya “Şerê Gelê Şoreşgerî” de hate meşandin. Ji heft salî heyanî heftî salî cihê xwe têde girtin û di serî de jin di pêşengiya vê berxwedanê de cihê xwe girt.

Ji xwe rola jinê di Şerê Gelê Şoreşgerî de xurt bû dema ku bi awayekî berbiçav li hember dijmin li ber xwe da û bû pêşengê civakê. Her wiha jin xwedî roleke mezin bû di pêşengiya şoreşê,



tenzîmkirina civakê û di qada siyasî, leşkerî, perwerde û gelek beşên din de girt.

Girêdayî rola jinê û helwesta wê li hember êriş û gefên ku bi hişmendiya desthilatdariya baviksalarî tên meşandin; Endama Meclisa Jin a Partiya Yekîtiya Demokrat PYD’ê Wehîde Xelîl ji Rojnameya me re axivî.

**‘Rêxistinkirin û zanebûn rêya gihaştina azadiya rast e’**

Endama Meclisa Jin a PYD’ê Wehîde Xelîl diyar kir ku bi hezarê salan ji ber zihniyeta zayendperestî jin ji cewher û rastiya xwe hate dûrxistin, herwiha di nav civakê de bê rol û îrade hate hiştin û wiha berdewam kir: “Piştî lidarxistina şoreşa Rojava, bi taybet di nava Şerê Gelê Şoreşgerî de jinê rol û mîsyona xwe îsbat kir. Jin tevlî nava qadên jiyanî bû û cihê xwe di çêkirina biryarê de girt û li kêleka mêr xebat da meşand û di nava sîstema hevserokatiyê de bi rengekî çalak cihê xwe girt. Jinê xwe di hemû waran de pêşxist, di serî de di warê leşkerî, siyasî, dîplomasî û aborîyê de bi fikir û felsefeya Rêber Apo di milê bîrdozî, hişmendî û fikrî de xwe rêxistin kir û di aste pêşengiyê de xebat da meşandinç xwe ji dunayê re da ispatkirin ku rêxistinkirin û zanebûn bi rêya gîhaştina azadiyê pêkane.”

Wehîde Xelîl destnîşan kir ku jinê di kar û xebatên komînal de bê ferq û cudahî di navbera hemû pêkhateyên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê de bi yek deng û destî, bi keda salan îro kar û xebatên xwe di hemû waran de dide meşandin.

**‘Bi armanca ku jin bê hêz bimîne, êriş li ser tê kirin’**

Wehîde Xelîl diyar kir ku jinên birêxistinkirî parastina civak, xweza û kesayeta xwe dike, lewma jî tirsa desthilatdariya baviksalarî ji vîn û hêza jinê heye û wiha anî ziman: “Ji ber vê yekê bi sedan jinên pêşeng li Rojavayê Kurdistanê herwiha parçeyên din bûne armanca van sîsteman. Di serî de dewleta Tirk a dagirker ku bi hezarê caran hewil da dengê jinê tune bike û îradeya wê bişkîne, lê berûvajî vê yekê her jineke pêşeng dihat şehîdxistin bi hezaran jin li du şopa wê diketin rê.”

**‘Ji bo misogerkirina parastina xwe jinê di warê leşkerî de xwe pêşxist’**

Wehîde di berdewamiya axaftina xwe de ev enî ziman: “Tevî zext û êrişên domdar ku li ser herêmê pêk tê jin amade ye ku parastina xwe û gelê xwe bike di çarçoveya Şerê Gelê Şoreşgerî û li dijî hemû cureyên êrişan bisekine. Jin bi awayekî baş hatiye rêxistinkirin, di warê leşkerî de xwe pêşxist û hêza xwe ya taybet avakir. Avakirina YPJ’ê armanca wê di serî de li hemberî êriş û xeteriya çeteyên DAIŞ’ê û dagirkeriya Tirk û çeteyên wê parastina jin û civakê bike”.

Wehîde Xelîl destnîşan kir ku jinê bi firkir û felsefeya Rêber Apo xwe perwede û rêxistin kirin û wiha got: “Tu carî wê desthilatdariya balviksalarî jinan neşkîne, tevî zext û êrişên ku têne kirin, jin asta têkoşîna xwe bilinditir dike. Her wiha tevlîbûna jinê ji hemû beşên jiyanê re û di asta pêşengtiyê de hişt ku di serî de baweriya wê bi wê were û li kêleka wê jî baweriya civakê qezenc bike”.

**‘Berxewedaniya jinê wê neyê sekinandin’**

Endama Meclisa JIin a PYD’ê Wehîde Xelîl wiha axaftinên xwe qedand: “Tevî rewşên zehmet, êriş û gefên li ser herêmê têne kirin berxwedan û têkoşîna jinê di asteke herî jor de tê meşandin. Şerê Gelê Şoreşgerî yê ku tê meşandin û encamên ku derketine holê, îsbat kirin ku jin bi vîn, hebûn û rêxistina xwe dikare xwe û civakê tevahî biparêze.”



# Ji çiraxên wêjeya Kurdî

**Can Yûsif**

Helbestvan Ehmed Şêx Salih Çavkaniyeke ava wê qet namiçiqe û çiraxeke ronahiya wê qet venamire. Wêjeya Kurdî rolek girîng lehîst di tevgera rizgariya neteweyî ya gelê Kurd de, ew amûrek bû ji bo belavkirina hişmendiya neteweyî û çandî di nav gelê kurd de, û herwiha amrazek bû ji bo xurtkirina nasnameya neteweya gelê kurd û di heman demê de, ew bû çavkaniyek ji bo îfadekirina xewn, hêvî û daxwazên neteweyî yên gelê kurd û derbirîna êş û azarên wan û herwiha ew bû navgînek hêzdar ji bo parastin û pêşxistina çand, ziman û nasnameya neteweyî ya kurdî.

Bi rêya nivîskarên kurd, dîrok û çanda gelê kurd hat belgekirin û hişmendiya neteweyî di nav gelê kurd de hate xurtkirin. Herwiha mîrasa çandî, nasnameya neteweyî û zimanê kurdî, tevî ewqas salan ji çewisandin, polîtîkên zordestî, dûrxistin, qirkirina neteweyî û nepênasîna hebûna gelê kurd ku ji hila hikûmetên dagirkerên Kurdistanê ve hate parastin. Nivîskar û helbestvanên Kurd bûne mîna lehengên azadiyê û parastvanên nasnameya neteweyî, çandî û dîrokî ya gelê kurd, helbestvanê kurd Ehmed Şêx Salih yek ji wan helbestvanên kurd yên neteweyî û hevdem tê hesibandin ku xebatên xwe yên wêjeyî û candî terxan kirîn ji bo xurtkirina çand, ziman û dîroka kurdî û parastina nasnameya neteweyî û siyasî ya kurdî di riya helbest û nivîsarên xwe yên wêjeyî û çandî.

Ehmed Şêx Salih di sala 1935’an de li gundê Endîwerê yê girêdayî bajarê Dêrik ji dayîk û bavek kurd (Şêx Salih û Ayşe) hatiye dinyayê. Di nav malbatek kurdperwer, welatparêz, kedkar, bawermend û rewşenbîr de mezin bû, ku girêdayî bi nirxên kurdayetî û evîndarê azadî û aştî yê. Malbatek ku ji çar kesan pêk dihat ( du keç (Emîne û Fitma) û du kur (Ehmed û Mihemed). Wî zaroktiya xwe di himbêza xwezaya Kurdistanê de, li ser sêlaka qeraxên çemê Dîcle û kenarê ava Seqlanê Meman û di navbera kavilên Minarok û Aşê Çep û gundê Xwarê, li ser pêmayên Berê Zingil û Qijle û li bin sîberên darên tûyên li Kanîya Xeyda û Nawala Koştîy û li ser kevanên Pira Bafit ya kevnare derbas kiriye, ew li ber xuşxuşa pelên darên Hinar û Hejîr û wêşiyên dêliyên tiryên dehla Endîwerê mezin bûye.

Li wir giyanê wî li ser bedewiya ziman û xweşikbûna xwezayê vebû, û hişmendiya wî ya edebî û çandî hate avakirin û hinêra wî destpêkir, li ber awazên xumxuma pêlên ava çemê Dîcleyê û sirûdên xuşîna ava Kanîya Qulteyîn û pestînên vedenga bayên ku ji Çiyayê Cûdîyê bilind tête ku asîmanan himbêz dike.

Wî fêrbûnên xwe ya destpêkê li ber destê olarên kurd girtin, piştre wî dibistana seretayî li bajarê Dêrikê xwend, ku li wir wî bawernameya “sertîfîka” bi dest xist (bawernameya seretayî), piştî vê, ew bû yekem mamostayê fermî yê li gundê Eyndîwerê û evê yekê hişt ku ew bibe kesayetek navdar yê perwerdehiyê li herêma xwe. Meylên wî yên wêjeyî û çandî û hezkirina wî ji nivîsandin û helbestê re destpêkir dema ku ew hîn di ciwaniya xwe de bû, di bin bandora şoreşên kurdî, bavê manewî yê kurdan”Mela Mustefa Barzanî”û helbestên Mela Ehmedê Cizîrî û Ehmedê Xanî, û stranên helbestên dînî. Ehmed Şêx Salih helbest nivîsand bi zimanên kurdî û erebî, di helbestên wî de bedewiya vegotinê û kûrahiya wateyan diyardikin ku di dilên xwendekaran de şopa ku hiştîn nayê jibîrkirin.

Helbestên wî di hilbijartina gotinan û bedewiya vegotinê de xuyane û helbestên wî gelek mijaran digrin nava xwe mîna (welat, berxwedan, mirov û nasname, hezkirina welat û azadî, xemgînî û trajediya, evîn û jiyan) Wî mîrateyek helbestî ya dewlemend ji bo wêjeya kurdî hişt û di heman demê de hatibû nasîn ji hêla beşdariyên xwe yên wêjeyî û siyasî ve ku bandorek kûr li ser çanda kurdî li pey xwe hişt .

Wî li ser xwezaya Kurdistanê û bedewiya wê, li ser çiyayên Kurdistanê û bilindahiya wan, li ser Şoreşa Îlon û qehremanên wê, li ser xem û êşên kurdan, li ser pêşmerge û serokên wan, li ser evîna welat û buharên wê, li ser azadî û serxwebûna welat, li ser sembol û ala Kurdistanê nivîsandiye.

Ew beşdarî gelek şevbuhêrkên wêjeyî û festîvalên çandî, çi li ser asta kurdistanî an jî welatê Erebî bûye. Helbest ji bo wî ne tenê gotinên derbasbûyî û bêwate ne; derketiyê holê, lê hestekî germ û kûr e derbasî dil û giyan dibe û hişê mirovan bi bedewiya xwe tije dike û hestekî bi hêvî û ronahî ku tucaran navemire dide mirov, ev hemû di helbestên helbestvan Ehmed Şêx Salih de tên dîtin.

Ew tê nasîn wekî helbestvanekî afrîner û sembola helbestvanan, penahê peyvanên bedew û hestên bilind, helbest ji wî fêr dibe wateya afrandinê, peyvên wî tîrêjên roja zêrîn xêz dikin, da ku ji nav kûrahiya hestên nazik, dersên bedew bigrin, Ehmed Şêx Salih tê nasîn bi hilberîya helbestê ya ku hevrêziyê dike di navbera kevneşopî û nûjeniyê de. Hinêra wî ya wêjeyî tenê bi nivîsandina helbestê re sînordar nema, lê wî gelek gotar û lêkolînên edebî li gelek platformên (menberên) çandî, rojname û kovarên edebî nivîsandin, ew pir jêhatî bû bikaranîna rêzbend û kêşê de, ku vê yekê hevrêzîyek taybet û balkêşîk li helbestên wî zêde kir.

Ew di hilbijartina pêlawazan de pir baldar bû, vê yekê alîkarî dikir di nîşandana bedewiya zimanê kurdî de û di afrandina rîtmek taybet di helbestên xwe de, evê hişt ku helbestên wî di demên dirêj de bimînin wek yek ji şaheserên wêjeya kurdî, ku tê de derbirîna hestên evînê û êşên dûrbînê, hesreta hevalan û evîna welat têne îfade kirin, wî di warê helbesta kurdî de bi helbestên xwe yên ciwan ên ku diyarin bi kûrahiya wateyan û bedewiya peyvan, bandorek bêhempa li dû xwe hişt, ji helbestên wî yên navdar:

1-Xortên Melê ne
2- Şiyarbûm konê reş xweya kir
3-Cana min cana min
4-Sirûda Pêşmerge
5- Kurdistan
6-Şoreşa Gulanê ya Serketî
7-Barzanî
8-Rêbaza Yekîtî
9- Şoreşa Îlonê ya Mezin
10-Şoreşa pak û nehîn û ji helbestên wî yên bi zimanê Erebî yên ku hema her gav di nav gundiyên Eyndîwerê de têne xwendin û dubarekirin, yên herî navdar evin:
1- Gundê me Bûka gundaye
2-Şoreşa Sor

Ew tevlî Partiya Demokrat a Kurdistanê ya Sûrîyayê bûye ji destpêka damezrandina wê ve di sala 1957’an ve, piştî sê salan, ew bi komek têkoşerên kurd re, mîna ( Osman Sebrî û D.r Norden Zaza) di sala 1960’an li bajarê Helebê ji hêla hukumeta Sûrîyê ve hat girtin û ew hate veguhastin ji bona zindana Mezê li Şamê, li wir ew rastî işkenceyek hovane ku hişê mirov nakşînê hat. Ji ber helwestên xwe yên siyasî û neteweyî yên wêrek û çalakiyên netewî û wêjeyî, ew bû armanca şopandinê ji aliyê dozgeriya ewlehiyê ve û bi dehan car ji hêla rayedarên rejîma Sûrî ve hat girtin.


Ji nav berhemên herî girîng yên wî, di sala 2015’an de wî dîwana helbestê bi navê “Asoma Girtinhevê” belav kir. Ku bi awayên herî bedew, gotinên wê hatine verêstin û peyvên wê hatine hilbijartin wekî ku zêr ji kûrahiyên deryayê têne neqandin, rûpelên jiyanê diafirîn, tê de felsefeya desthilatdarî û rêveberiyê, dersên şer û aştiyê û nehînîya hebûna mirovan eşkere dibin, heya ku gotinên wî bûne cihnîş ji bo ramanê ronakbîrî, ku şefeq didin li pêşiya her kesên ku li ronahîyê digerin di kûrahiya serdeman de.

Gelek hunermendên mezin ên Kurd ji helbestên wî strandine, bi taybetî jî: Hunermend Mihemed Şêxo gelek helbestên wî yên ku ji hêla kûrahiya xwe ya hestyarî û welatparêz ve têne zanîn, gotiye, ên navdar ji wan helbestên evin: Şiyarbûm, konê reş xwe yakir(Piştî mirina kurê xwe AbdulXifar di sala 1984’an nivîsandiye.

“Cana min, cana min”

Xortên Melê ne (Ev li ser pêşmerge Mele Mustefa nivîsandiye.

-Seyîd Gabarî û him Karwan Kamil û hin hunermendên kurd yên din jî gelek helbestên wî awaz ji wan çêkirin û strandine ..Ev stranên han ji karên navdar têne hesibandin ku ruhê neteweyî û nasnameya çandî ya kurdî di wan de têne xuya kirin û alîkar bûn di bilindkirina cihê helbestvan Mele Ehmed Şêx Salih de wek yek ji stûnên wêjeya kurdî ya hevdem. Di sala 2015’an de, peymangeha Bedirxan ya Zimanê Kurdî ew bi bawernameya rêzgirtinê xelat kir. Di sala 2016’ê de jî, wî xelata salane ya Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê ya



Sûriyê wergirt, wekî rêzgirtinek ji bo xebatên wî li qada ziman û edebiyata kurdî. Ew di 22’ê Cotmeha 2017’an de li nexweşxaneya Şar a li bajarê Hewlêrê, paytexta Herêma Kurdistanê, di temenê 82 saliya xwe de jiyana xwe ji dest da. Ew li cihê jê dayikbûyî bi amedebûna girseyek mezin ji Rewşenbîr û xelkên herêma Dêrikê hate oxir kirin, wî wesyet kirbû ku kes li ser gora wî tu axaftin û helbestên şînbariyê nebêje.


Helbestvan Ehmed Şêx Salih di nava bêdengiyê de hate oxirkirin, li pişt xwe valehîyek hişt ku nayê dagirtin û birînek kûr hêla xwîn her jê tê rêtin, wî êşek mezin di dilê hezkiriyên xwe de hişt, ewê bimîne sembola neteweyî ya dayîn û dilsoziyê.

Ehmed Şêx Salih yek ji kesayetiyên torevanî yê herî diyare di Rojavayê Kurdistanê de û ji navdartirîn helbestvanên kurd yên hemdem û klasîkî tê zanîn, helbestên wî bi şêwazê klasîk û zimanekî bi hêz û xurt hatine nivîsandin. Wî li dû xwe mîrateyek edebî ya dewlemend a helbest û wêjeyê hişt û roleke girîng di dewlemendkirina wêje û çanda kurdî de lehîst bi riya kar û beşdariyên xwe yên torevanî, rewşenbîr û ramyarî.

Tevî ku gelek ji helbestên wî nehatine komkirin di dîwanên weşandî de, û gelek ji wan di bin axê de riziyane û hin ji wan di tarîya şevên reş de hatine şewitandin ji tirsa lêgerîn û şopandinê ji hêla desthilatdariya ewlekariya Sûriyê ve, lê her wisa bandora wî ya edebî hîn jî di bîra çandî ya kurdî de dijî. Ehmed Şêx Salih dê her dem bimîne di dil û bîra gelê Kurd û hezkêrên wêjeya kurdî û erebî de, mîrasê wî yê edebî û siyasî dê berdewam bike di ilhama nifşên nû û dewlemendkirina mîrateya çandî ya kurdî de.

Helbestvan Ehmed ne tenê helbestvanek neteweyî an jê zanyarek olî bû, lê ew çemekî diherikî ji zanistê û çavkaniyek bû ji zanînê ku qet tucaran zuha nabe,wî sinorên cih û deman derbaskir, ew avdide hişê nifşan mîna ku cobarên avê avdidin xaka tîbûyî, di gotinên wî de jiyan diafire, di rehwanbêjiya (belageta) wî de qanûn jê diherike, û di tîpên wî de nasnameya netewe jê diçirise .Ji bo giyanê wî yê pak serbilindî û mandarî

Ji bo mîrateya wî ya tekoşînî, wêjeyî û çandî mayînde û domdarî.



## Xwedîkirina ruhê şoreşê

**Remezan Olçen**

Di demên şoreşên civakî, aştî û demokratîk de, çand û ziman ne tenê xwezayîyek yan jî diyardeyên estetîk in, tevî wê ew di heman demê de nasnameya gelan û ruhê şoreşê ne. Hunermend, wek deng, wijdan û çavkaniyên civakî, di navbera propaganda û rastiyê de rolê xwe dikin. Madem rastî bi vî rengî ye wê demê gelo çand, ziman û huner bi çi rengî dikarin şoreş û demokrasiya civakî pêk bînin û di vî warî de erk û mîsyoneke wan a çawa heye?

Çand wek huner, stran, folklor û danehevên tecrûbeyên civakê giştî ye. Bi rêya çand û hunerê ku hem di jiyana rojane de hem jî ji bo ayendeyê xwedî giringiyeke mezin e, festîval û cejn rojên taybet in. Bi rêya rojên wisa civak zêdetir bi hev re dikeve nava têkiliyê. Hevdîtin bi xwe re parvekirina tecrûbeyan jî, bi hev re famkirin û serwextbûna li hev jî pêk tîne. Civak di rojên wisa de temasê heqîqeta xwe dike. Îcar rojên wisa taybet ên weke festîval û cejnan dibe ku herêmî û dibe ku giştî be jî bi xwe re ruhê civakê zindî dike. Di parçeyê de tevahî di tevahî de parçe tê parastin ango bi reng û dengê xwe xwe heyî dike. Ev jî bi xwe re ruhê civakî zindî dihêle.

Ziman, bi taybetî jî zimanê dayikê, di şoreş û demokrasiya civakî de bingeh e. Ji ber ku ruhê civakê ya bi çand û dîroka wê afiriye encax bi rêya ziman dikare xwe îfade bike. Bêyî ziman, gel dibe ku nasname û mafên xwe ji dest bidin. Xweîfadekirin belkî jî herî xurt bi rêya ziman dibe. Heke civak ne xwediyê zimanê xwe yê dayikê be û lê hatibe qeexekirin, wê nikaribe ruhê xwe îfade bike. Di vê dûryana dîrokî de ku Kurd dikarin çarenûsa xwe diyar bikin, ji her demê zêdetir pêdivî bi xwedîderketina li ziman û çandê derdikeve holê. Em encax bi vê re dikarin nasnameya xwe înşa bikin. Rengiya xwe biparêzin. Îcar di vir de roleke mezin dikeve ser hunermendan. Hunermend xwedî roleke diyarker in. Ew hem çand û hem jî ziman vediguhêzin ayendeyê. Vediguhêzin nifşan.

Çalakiyên hunerî yên bingeha xwe ziman û çand e dikare bibe ala û qada herî bedew a şoreşa civakî. Weke mînak, mozîk, şano, sînema, wêne û beşên din ên hunerê, weke wêje li ser şoreşên civakî, dikarin ji xapandin û propaganda yên hegemonî re bibin barîkat û çeperên xurt ên berxwedanê. Her civak û gelê ku bi zimanê xwe çanda xwe bidomîne, pêş bixe û veguhêze ayendeyê dikare hêz û nasnameya xwe çalak û zindî bihêle, şoreş din ava şoreşê de pêş bixe.

Hunermend ji ber wê xwedan cihekî taybet in. Ew wek çavkanî û dengê civakî, di navbera propagandayên hegemonî û rastiyê de parzûna civakê ne. Propagandaya hegemonî dixwaze ku gel bi derewan bijş, ji rastş û heqîqeta xwe dûr bikeve, lê hunermend bi stran, film, şano, roman, helbesta xwe dikare civakê bi heqîqeta wê re bike yek, hêz û ruh bidê. Em ji bîr nekin; çand û ziman ne tenê hunerî ne, lê herwiha diyardeyên nasnameya gel û ruhê şoreşê ne.

# ‘Dewleta Tirk şerê avê dimeşîne’

Şêwirmendê lêkolînên av û ekolojiyayê Alaa Hibo da zanîn ku bi sedema şerê avê yê ku dewleta Tirk dimeşîne, herêm ber bi zuhabûnê ve diçe, rêjeya ava binerd daketiye 50 mitreyan û got, “Dewleta Tirk şerê avê dimeşîne û çareyên mayinde pêk nayên.”

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**





Rewşa ava herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê mijareke gelekî girîng e ji bo berdewamkirina jiyana mirovan li vê herêmê. Ji ber rewşa avhewayê, şerê avê yê ku bi destê dewleta Tirk dide meşandin, asta ava binê erdê daketiye û li gorî pisporên girêdayî ava binerd, ev diyarde xeternak e. Derbarê heman mijarê şêwirmendê lêkolînên av û ekolojiyayê Alaa Hibo ji rojnameya me re axivî.

**‘Rêjeya ava binerd daketiye 50 mitreyan’**

Hibo diyarkir ku rêjeya ava binerd daketiye 50 mitreyan û wiha bi lêv kir: “Rêjeya ava binerd li herêma me ji 50 salî û bi şûn de 50 mitreyan bi jêr ketiye. Berî vê demê, dema ku bîrek li Qamişlo bi taybet deverên nêzî sînor dihat kolandin, bi kûrahiya 3 mitreyan av derdiket. Di dema heyî de eger li heman deveran ku bîr werin kolandin, heya 50 mitreyan encex av were derxistin. Gelek sedemên kêmbûna avê hene, yek ji wan sedeman, kêmbarîna baranê, çikandina kanî, çem û newalên herêma me. Ev hemû jî bi destê dewleta Tirk hate kirin, wê di çarçoveya şerê avê de hemû jêderên ava herêmê qut kirin. Da ku dewleta Tirk avê li ser me qut bike, bi dehan bendav li ser çemên ku tên Rojava, ava kirin. Di heman demê de bi hezaran bîrên gelekî kûr(deriyayî) li nêzî jêderên ava ku me jê sûd werdigirt, kolandin. Êdî bi yek carê çemên ku gelê Rojava sûd ji ava wan digirt, çikiyan.”

**‘Rewşa ava binerd xerab e’**

Alaa Hibo destnîşan kir ku rewşa ava binerd ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê xerab e û wiha got: “Li herêma Cizîrê 10 bendavên avê hene, lê mixabin rewşa wan ber bi zuhabûnê ve diçe. Tenê Bendava Sefan rewşa wê ji yên din çêtir e, lê dîsa rêjeya ava wê ji dema bûrî kêmtir e, ew dikare 48 melyon m3 av vehewîne nava xwe, lê niha kêmî 20 melyon m3 vedihewîne. Rûbera Bendava Hesekê ya Rojhilat 295 melyon m3 e û zuha ye, Bendava Hesekê ya Rojava 95 melyon m3 e ew jî zuha ye û Bendava Icaca jî 550 melyon m3 e, çirav û bermahiya petrola Rimêlan tê de dicive. Bendavê din jî rewşa wan xerab e, eger baran di sala bê de nebare wê zuha bibin. Ev yek jî wê bandoreke mezin li ava binê erdê bike, rewşa ava binê erdê pir xerab e. Berî salên 2000’î her 10 salan heya ku salekê baran nedibariya, lê piştî sala 2000’î her 3 yan 4 salan salekê tenê baran dibare, di wê salê de jî ewşa zeviyên çandiniyê lawaz bû û bi kotekî dihatin çinîn.”

**‘Şerê avê yê Tirkiyê, herêmê ber bi zuhabûnê ve dibe’**

Hibo anî ziman ku bi sedema şerê avê yê ku dewleta Tirk dimeşîne, herêmê ber bi zuhabûnê ve dibe û wiha domand: “Dewleta Tirk bi vê siyasetê çemê herî mezin weke çemê Xabûr zuha kir, hem jî ava kaniyên Serêkaniyê jî qut kir. Li aliyekî din para ava çemên Firatê ya Sûriyê û Îraqê gelekî daxist, ji beriya niha di çirkeyekê de xurtbûna ava Firatê 750 m3 bû, lê di dema heyî de nagihe 200 m3. Li bendava Firatê berî niha 14 milyar m3 av lê kom dibû, lê di roja îro de bûye 4 milyar m3, di encamê de jî rewşa elektrîkê lawaz bû. Niha jî gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji ber tunebûna elektrîka Bendava Firatê bê elektrîk in. Dewleta Tirk bi vê siyaseta şerê avê berê herêmê û ava binê erdê ber bi zuhabûnê ve dibe. Ne tenê rewşa me wiha ye, li Îraqê û Îranê jî xeteriya çolbûnê heye, sedem jî guhertina avhewayê û şerê avê yê ku dewleta Tirk dimeşîne.”

**‘Dewleta Tirk şerê avê dimeşîne û çareyên mayinde pêk nayên’**

Şêwirmendê lêkolînên av û ekolojiyayê Alaa Hibo da zanîn ku dewleta Tirk şerê avê dimeşîne û çareyên mayinde pêk nayên û wiha axivî: “Dewleta Tirk ji sed salî ve şerê avê li ser gelê Kurd dide meşadin, wê çem, kanî, newal û hemû jêderên avê çikandin û rewşa ava binê erêdê xerab kir. Di heman demê de rejîma Baas ti çare ji bo vê pirsgirêkê pêk neanî. Milet neçarbûn ku bîran bikolin û kolandineke bêserûber hat kirin. Di roja heyî de em ava xwe û jêderên avê naparêzin, lêkolînan li ser avê û rewşa wê çênakin, di heman demê de li herêma me Rêveberiya Xweser palpiştiyê bernade li ser pisporên xwe yên girêdayî mijara ava binerd. Em dibînin ku eger em di vê rewşê de bimînin, salên li pêş wê av li herêma me nemîne û koçberiyeke pir mezin çêbibe li herêma me, ji ber her ku diçe pirsgirêka avê mezintir dibe û çareyên mayinde nayên pêkanîn. Heya ku ev pirsgirêk çareser bibin divê çareyên mayinde ji bo kirîza avê werin pêkanîn.”

# Zarok her tim dibin qurbanên şer

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**





**Zaroka bi navê Henan Elî ya ku ji bajarê Serêkaniyê bi darê zorê ji milê dagirkeriya tirk û çeteyên wê koçber bûye û niha li kampa Newroz jiyan dike diyar kir ku jiyana wê ya di nava kampê de pir zor û zehmet e, ew hêvî dike ku di zûtirîn dem de vegere bajarê xwe.**

Di 18’ê Adara 2018’an de herêma Efrînê ji aliyê dewleta Tirk ve hat dagirkirin. Gelê Efînê hate koçberkirin û di destpêkê li herema Şehbayê û pyre jî li herema Cizîrê di kampande jiyana xwe berdewam dike. Herwiha di 9’ê Cotmeha 2019’an de jî bajarê Serêkaniyê û Girê Spî jî, piştî şer, pevçûn û berxwedana welatiyên herdû bajaran, ew jî bi dare zorê ji warên xwe hatin koçberkirin. Bi dagirkirina van herêman re kuştin, revandin, talankirin û destdirêjî li ser jinan pêkhat, gelek kesan jiyana xwe ji dest dan û hin jî birîndar bûn, herwiha di nava van kesan de zarok jî hebûn. Gelek zarok û jin di nava şer de hatin kuştin, revandin û işkence li wan hate kirin. Piştî dagirkirina Serêkaniyê gelê wê bi dare zorê hate koçberkirin û berê xwe didin kampa Newroz, di vê kampê de gelek zor, zehmetê dîtin bi taybet jî zarokan gelek zehmetî dîtin û jiyana xwe ya zaroketiyê jiyan nekirin. Jiyana welatiyên Serêkaniyê û bi taybet jî zarok û jinan di nindirê kampê de pir zor û zehmet e.
Di vê çarçoveyê de zaroka bi navê Henan Elî ya 9 salî ji Rojamneya me re behsa jiyana xwe û zehmetiyên ku di hindirê kampêde jiyan dike kir.

**‘Şer jiyana zaroakan ji wan stand’**

Henan Elî ji Serêkaniyê ye. Keçikeke neh salî ye, di biçûkaniya xwe de ji ber êrîşên dewleta Tirk û çeteyên wê ve hatiye koçberkirin. piştî koçberiyê berê xwe dide kampa Newroz û li wê derê bi cih dibe. Henan bi zehmetiyên koçberiyê û jiyana di kampê de rû bû rû dimîne. Henan di nava şer û pûvçûnan de mezin dibe, ji biçûkniya xwe de jiyanê xwe di nava şer, zehmetî û koçberiyê de dijî. Henan mala ku lê jiyan dikir ji beriya ku koçber bibe nedîtiye, ji ber ku dema koçber bûye ew biçûk bû, lê dema ku ji bav û dayika xwe li ser bajarê Serêkaniyê dibhîst, wê gave hêvî û meraqa dîtina bajarê Serêkaniyê mezin dibû.
Henan her roj çavê xwe ji xew vedike û bi hesrete ku bi hevalên xwe re vegere bajarê xwe û bi aramî bijî jiyan dike. Henan zarokeke ku jiyana xwe di koçberî û şer de derbas kiriye. Jiyana xwe weke hemû zarokên cîhanê jiyan nekiriye. Henan bi hatina demsala havînê re di nava kampê de gelek zehmetiyan dibîne, ji ber ku germahiya di kampan de zêdeye û zivistana wê jî gelek sar e.

**‘Em jî dixwazin weke hemû zarokan jiyan bikin’**

Henan difikire ku wê çawa jiyana xwe di kampan de berdewam bike û di pêşerojê de wê çawa jiyanek xweş weke jiyan hemû zarokên cîhanê jiyan bike. Henan ji xwe pirs dike û dibêje? Ma ne ji mafê mine ku ez jî mîna hemû zarokên cîhanê di nava aramî û ewlehiyê de bijîm? Henan rûxmî hemû zehmetiyên ku dibîne jî, lê hêviya vegera bi ewle her tim di dilê wêde lêdide. Xwesteka wê ew e ku li bajarê xwe jiyana xwe berdewma bike û bi hevalên xwe re lîstikên xwe di nava aramî û azadiyê de bilîzin.
Henan di dawiya axaftina xwe de got ku: Hêviya min ew e, di cîhanê tevahî de aramî û aştî pêkwere û zarok di nava aramiyê de bijîn.



# 7 sal ji xebat, têkoşîn û berxwedaneke serketî

Rêveberiya Xweser di nava 7 salan de bi kar û xebatên xwe yên xizmetguzarî, siyasî, dîplomasî, leşkerî û rêxistinî de serkeftinên mezin qezenc kir û ji bo avakirina Sûriyeke nenavendî û pirreng bûye hêviya tevahî gelên Sûriyê.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

6’ê Îlonê salvegera 7’an a damezrandina Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Rêveberiya Xweser li ser bingehê xwespartina gel, hevkarî, jiyana hevbeş û avakirina vîneke azad ji tevahî pêkhateyan hate destpêkirin û avakirin. Wê xeta sêyemîn bingeh girt û ew dûrî nakokî û şerê ji bo desthilatê li Sûriyê ye.

**Banga demokratîk a gelan**

Di sala 2011’an de, tevgera gel li Sûriyê wek bertekek li hember polîtîkayên dewleta navendî, dûrxistin û înkarê di hemû qadên jiyanê de nîşan dan û banga azadî, guhertina demokratîk û rûmeta mirovî kir. Piştî ku hêzên navneteweyî û herêmî li gorî ajandayên xwe û berjewendiyên dewletî yekser û ne yekser destwerdan li krîza Sûriyê kirin û komên îslamî yên radîkal ji çar aliyên cîhanê derbas kirin, ev bû sedema dûrketina tevgera gel ji rê.

**Rêveberiya hevbeş**

Sala 2011’an piştî ku şoreşa gelan dest pê kir, gelê herêmê bi rengê saziyên civaka sivîl û bi birêxistinkirina saziyan xwe bi rê ve bir. Ji bo birêvebirina vê herêmê û peydakirina derfetên jiyanê pêwîstiya pergaleke rêxistinî hebû. Li gorî vê pêwîstiyê di 21’ê Çileya 2014’an de Rêveberiya Xweser ya herêma Cizîrê hat ragihandin. 27’ê Çileya 2014’an de li herêma Firatê û 29’ê Çileya 2014’an jî li herêma Efrînê Rêveberiya Xweser hate ragihandin.
Ji bo van rêveberiyan pêwîstî bi rêveberiyeke hevbeş hebû ku di milê mekanîzmayeke hevbeş, perspektîfan, çareseriya pirsgirêkan û wekheviya aborî bê avakirin. Lewma di kongreya Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) de biryar hat dayîn ku Rêveberiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ava bibe, da ku bikare wan 7 rêveberiyan bigihînê hev. Di encamê de 6’ê Îlona 2018’an Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê hate ragihandin. Di Cotmeha 2018’an de jî 10 deste û 8 ofîsên rêveberiyê hatin ragihandin. Di Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê de 3 meclis; Meclisa Zagonî, Meclisa Rêveberî û Meclisa Dadê cih digirin.
Ev rêberî li ser bingehên nîştimanî û civakî hate avakirin ku ew ê çareseriya giştî bi xwe re bîne. Di heman demê de ji bo hemû pirsgirêkên li Sûriyê û herêmê modeleke guncav e. Ev rêveberî xwe dispêre rêgezên jiyana hevbeş û pirçandî ku ew jî li ser bingeha fikir û felsefeya neteweya demokartîk hatiye destnîşankirin ku civak xwe bi rêve bibe, daxwazên xwe bi cih bîne û sînorê siyasî yê cografiya Sûriyê biparêze.



**Hemdan El-Ebid**

**Rêveberiya Xweser roleke pêşeng di çareseriya siyasî de list**

Rêveberiya Xweser di demeke kurt de aramî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê geş kir û mayîndebûna hevkariya rasteqîn di navbera pêkhateyan de parast. Projeya siyasî li ser bingehê yekîtiya Sûriyê pêşniyar kir û pabendî wê bû, hem jî roleke pêşeng di çareseriya siyasî de lîst. Ev rêveberî nimûneya pêşeng a pêşxistin û pêkanîna çareseriyê li ser bingeha edalet û wekheviyê ye ku ne projeyeke li dijî Sûriyê û pêkhateyên wê ye. Ji ber projeya wê pêşkêş kiriye, nenavendîbûn e û ev projeya herî guncav ji bona Sûriyê ye.

**Têkoşîna domdar a Rêveberiya Xweser**

Rêveberiya Xweser li hemberî astengiyan disekine û asta têkoşînê bilind dike. Ruxmî tevahî projeyên fitne û tesfiyekirinê, lê ew ji bo pêşîlgirtina xeteriyan têkoşîneke domdar dimeşîn e. Di heman demê de Rêveberiya Xweser gelek pêşketin pêk anîn û di gelek saktorên perwerde, tenduristî û xizmetguzariyê de bi pêş ket û bi awayekî hevseng pêdiviyên pêkhateyan pêk anî. Hîna jî plan û projeyên ji bo xizmetguzariyên gel û pêkanîna pêdiviyên wan di şopandin û pêkanînê de ne.

**Rêzgarkirina ji serdema hovîtî û tarîtiyê**

Rêveberiya Xweser li şûna cîhanê li dijî çeteyên cîhanî li ser erdnîgariya Sûriyê şer kir. Tişta herî giranbuha pêşkêş kir, fedekarî bi zarokên xwe kir, da ku herêmek li pey a din ji hovîtî û tarîtiya DAIŞ û hevkarên wê rizgar bike. Di heman demê de ji destpêka avakirina Rêveberiya Xweser heya niha gef û êrişên taybet ên dewleta Tirk kêm neman. Çeteyên DAIŞ’e ji ku derbasî herêmê bibin û li dijî Rêveberiya Xweser şer bikin, dewleta Tirk hem rê hem jî alîkariya lojîstîkî da wan. Dewleta Tirk ji bo ku zextên xwe yên li ser herêmê zêdetir bike deriyê sînor jî girt û bi vê şewazê li hember herêmê ambargoyek aborî pêk anî. Êrişên siyasî jî bi awayê ambargoya siyasî pêk hatin. Tevî wê jî
hemû pêkhateyên Kurd, Ereb, Suryan, Ermen, êzidî, Çeçen, Çerkez û Tirkmen di herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê de dijîn, hem jî di sazî û dezgehên rêveberiyê de ji hemû pêkhateyên herêmê sivîl kar dikin.

Derbarê Salvegera damezrandina Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, cîgirê Hevserokatiya Meclisa Cîbicîkar a Rêveberiya Xweser Hemdan El-Ebid û hevserokê Nivîsgeha Kar û Barên Koçberan a Rêveberiya Xweser Şêxmûs Ehmed ji Rojnameya me re axivîn.

Hemdan El-Ebid bal kişand ser armanca damezrandina Rêbveriya Xweser û wiha got: “Rêveberiya Xweser ji destpêka damezrandinê ve rêveberiyeke civakî ye, armanca wê pêşxistin, parastina û xizmeta civakê ye. Di demeke ku herêm ji hikumeta Sûriyê ya berê hat valakirin û hewcdariya gel bi rêveberiyekê hebû ku parastina wan bike li dijî çeteyan, Rêveberiya Xweser ji tevahiya pêkahateyên herêmê li ser bingeha Netewa Demokratîk hat damezrandin.”

El-Ebid diyar kir ku Rêveberiya Xweser di tevahî qadan de ji bo gelên herêmê bû bersiv û wiha anî Ziman: “Rêveberiya Xweser di milê parastina ewlehiya herêmê de serkeftinên mezin qezenc kir, bi taybet di şerê li dijî terorê serkeftinên mezin bidest xist û DAIŞ şikand. Di heman demê de parastina yekîtiya xak û hevgirtina gelên Sûriyê kir.
Ji xwe tişa herî girîng ji bo mirov parastin û aborî ye, Rêveberiya Xweser bi keda gelên herêmê û bi saya fedekarî û xwîna şeîhdan Hêzên Sûriya Demokratîk ava kir û di ber tevahî cîhanê de têkoşîna li dijî terorê da meşandin.
Rêveberiya Xweser ji bo xizmeta gel binesaziya herêmê ji nû ve ava kir. Ji bo gelên Herêmê dibistan ji nûve hatin avakirin û sazkirin, minhacên xwendinê yên pêşketî hatin hazirikin, zanîngeh û peymandgehên pêşketî li gorî hewcedariya herêmê hatin avakirin. Herwiha di milê tenduristiyê de jî nexweşxane û navendên tenduristiylê hatin avakirin, xebatên tenduristiyê hatin pêşxistin û karmend hatin amadekirin. Rêveberiya Xweser li gorî derfetên xwe bajar di milê xizmetguzarî de rêxistin kirin, rê û kolan sererastkirin û elektirîk û av ji bo gel peyda kir.
Di qada çandiniyê de jî Rêveberiya Xweser ji bo hewcedariya herêmê plana çandiniyê danî û kar û xebat ji bo pêşxistina qada çandiniyê da meşandin.
Di milê çandî de jî her pêkhate bi rola xwe rabû û ziman û nasnameya çandî ya tevahî pêkhateyan hat parastin.”

Cîgirê Hevserokatiya Meclisa Cîbicîkar a Rêveberiya Xweser Hemdan El-Ebid diyar kir ku Rêveberiya Xweser ji bo tevahî gelên Sûriyê bûye hêvî û axaftina xwe wiha qedand: “Rêveberiya Xweser herdem ji bo alîkariya gelên Sûriyê gavên pîroz avêtin, mînaka wê jî alîkariya tevahî koçberan kir, alîkarî pêşkêşî xelkên beravê û Siwêdayê kir û heta niha jî alîkariyên wê berdewam in. Di aliyê dîplomasî û siyasî de, Rêveberiya Xweser kar û xebateke mezin da û dide meşandin, ji bo avakirina Sûriyeke nenavendî û pirreng danûstendinan bi tevahî aliyên cîhanî , herêmê û Sûrî re dike. Rêveberiya Xweser bi kar û xebatên xwe yên, xizmetguzarî, îdarî, siyasî , dîplomasî, ewlehî û rêxistinî bûye pergala herî gunacav ji bo avakirina Sûriyeke nenavendî ku mafê hemû pêkhateyan tê de parastî be.”

Di heman çarçoveyê de Şêxmûs Ehmed jî diyar kir ku avakirina Rêveberiya Xweser di demeke dîrokî de bû û wiha got: “ Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê di demekê pir dîrokî de ku rewşa Sûriyê gihabû asta herî bilind ji aloziya siyasî, aborî, ewlehî û civahî ve, hat avakirin. Pir êriş li ser Sûriyê û tevahî civaka Sûriyê ji hundir û derve, di heman demê de êriş û şerê çeteyan ku pişta xwe ji gelek hêzên herêmî digirtin, hatin kirin. Li hemberî wê daxwaza gelan a Sûriyeke domkratîk û nenavendî derket pêş ku Sûriyeke beyî êş, azar û desthilatdariyeke dektatorî be. Lewma dema Rêveberiya Xweser hat avakirin ji aliyê hêzên desthilatdar û çeteyan ve rastî êriş û gefên mezin hate. Mînaka wê êrişên ku li ser Efrîn û Şehbayê di sala 2018’an de hate kirin, di encamê de dewleta Tirk Efrîn dagir kir. Piştî wê sala 2019’an de Girê Spî û Serêkaniyê jî dagir kir. Armancê jê ew bû ku sîstema Rêveberiya Xweser hilweşîne û rê li pêşiya gavên mezin ên Rêveberiyê bigire. Ji ber wê jî rêveberiyê gelek zehemtî ji dema avabûna xwe û heya niha dikşîne ku bi dehên caran binesazî û hemû çavkaniyên jiyanî li herêmê bû hedefa êrişan, da ku civakê beramberî rêveberiyê derxîne.

Piştî hilweşandina rêjîma Baas jî dîsa herêmên din ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên wê hatin êrişkirin, bi taybet Minbic û Bendava Tişrînê. Ev êriş vê yekê didin diyarkirin ku di Rêveberiya Xweser de nimûneyeke serkeftî heye, hem jî ew sîstemeke nû ji bo Sûriyê û giştî Rojhilata Navîn ne.”



**Şîxmûs Ehmed**

**‘Îdyolojiya îslama radîkal astengiya li pêş rêveberiyê ye’**

Şêxmûs Ehmed da zanîn ku projeya Rêveberiya Xweser ji bo tevahî Sûriyê rêya tekaneya serkeftinê ye û wiha pê de çû: “Piştî 60 sal ji desthilata Baasê ku xwe didît rêveberê civak û dewleteke yekreng dida meşandin. Lê Rêveberiya Xweser tersî hişmendiya Baas têkoşîn da meşandin û di nava xwe de pirreng û pir netewên cûda hembêz kir, ji ber wê ew bû sîwana gelên herêmê. Îro jî desthilatdariyeke din li Şamê heye ew desthilatdarî jî mîna Baasê ye, yek rengî ye. Lewma ew jî nabe ji bo Sûriya siberojê. Tenê pergala Rêveberiya Xweser ji bo siberoja Sûriyê projeya serkeftinê ye. Ji ber ku civaka Sûrî, civaka aştîxwaz, azadîxwaz û demokrasîxwaz Rêveberiya Xweser pergalekî girîng dibînin. Lê tenê astengiya li pêş vê sîstemê îdyolojiya îslamî ya radîkale ku niha dewleta Tirk piştgiriya wê dike. Ji bo hemû pêkahteyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê Rêveberiya Xweser xwen û xeyalên wan bû îro jî pêk hatiye, sîstema xwe di nava civakê de ava kiriye. Lewma hemû pêkahteyên herêmê îro xwe li derdorî rêveberiyê pêc kirine.”

**‘Bixwebirêvebirina gelan Sûriyeke hevgirtî û nûjen bê avakirin’**

Şêxmûs Ehmed axaftina xwe wiha qedand: “Hêviya me hevgirtina ku Rêveberiya Xweser di nava pêkhateyan de daye avakirin xurtir û berdewamtir bibe. Ji bo wê pêwîst e gelên Sûriyê ji bo rêveberiya xwe bikin, hevgirtin û hemahengiyê di navbera herêman de ava bikin, da ku Sûriyeke nenavendî, hevgirtî û nûjen bê avakirin. Li ser vê bingehê em salvegera 7’emîn a Rêveberiya Xweser pîroz dikin, bi hêviya gav û serketinên mezin ji bo Sûriya siberojê, Sûriyeke ji bo tevahî gelên Sûriyê be.”

# ‘Ne êriş, parastin pêwîst e ji bo ragihandina Azad’

Rojnamevan Lava Ibrahîm da diyarkirin ku armanca êrîşê ne tenê rojnamevan Hemin Mamend bû, armanc Ragihandina Azad tevahî bû û wiha got: “Êrîşên bi vî rengî li dijî serxistina doza Kurd û Kurdistanê ye."

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

Rojnamevan Hêmin Mamend li Silêmaniyê di êrîşeke çekdarî de birîndar bû. Hêmin ji bo dermankirinê rakirin nexweşxaneyê. Li gorî agahiyan, du kesên li ser motorê li Kolana Aqarî ya Silêmaniyê êrîşî rojnamevan Hêmin Mamend kirin. Hêmin Mamend di êrîşê de birîndar bû û du gule lê ketin. Piştî êrîşê êrîşkar reviyan. Rojnamevan Hêmin Mamend li nexweşxaneyê tê dermankirin.

Derbarê êrîşa çekdarî ya li pêşkeşvan û nûçegihanê Stêrk Tv Hêmin Mamend de, Rojnamevan Lava Brahîm ji rojnameya me re axivî.

**‘Êrîşên li hemberî rojanemavanan ji bo qutkirina dengê rastiyê ye’**

Lava Ibrahîm êrîşa ku li ser rojnamevan Hêmin Mamend ya ku li Silêmaniyê qewimî bû, bi tûndî rexne kir û wiha dest bi axaftina xwe kir: “Gelek caran li hemberî rojnamevan û endamê ragihandinê kiryarên dijî mirovî pêk tên. Ew bi taybet li ser endamên Ragihandina Azad zêdetir dibe. Herî dawî li Başûrê Kurdistanê armancgirtina pêşkêşvanê Stêrk Tv Hêmin Mamend pêk hat û encama êrîşê da bi giranî brîndar bû. Ev ne cara yekeme ku herêma Başûrê Kurdistanê endamê Çapemeniya Azad tên armancgirtin. Heval Gulîstan Tara, Hero Bahadîn, Ezîz Koyluoglu û hwd. gelek kesayetên ku hewildana xebatên dengê rastiyê dikirin, bi destê dewleta Tirk hatin qetilkirin. Ji derveyî şahadetan jî, astengkirina karê ragihandina azad di herêma Başûrê Kurdistanê xwe dide pêş. Ji ber gelek caran saziya îstîxbarata Tirk MÎT rê li ber wan kiryarên dijî mirovî vedike. Ev bi bêdengî û hevkariya hikûmeta Herêma Kurdistanê û PDK’ê ye û weke kiryarên ji rêzê tên dîtin. Ji ber ku heya niha ti doz nehatine vekirin û tawanbarên wan kiryarên qetilkirina rojnamevanan nehatine eşkerekirin. Ger destwerdan an jî lêlpirsin hatiba kirin ew kiryar nehatin dûbarekirin. Ger bi demildest tawanbar neyên ditîn û raya giştî re neye xuyakirin rê li ber kiryarên wisa nayê girtin. Bêdengiya sazî û kesayetên peywendîdar tê wateya xwe mikûrhatin û pejirandina qetilkirina rojnamevanan. Erîşên li hemberî endamên xebatê çapemeniyê dengê rastiyê qutkirin e.”

**‘Qada ragihandina Kurdî rastî gelek zehmetiyan tê’**

Lava wiha li axaftina xwe zêde kir: “Ragihandina Kurdî û Azad heya xwe gihand asta navnetewî, rastî gelek êrîş û tûndîyê hat. Li Rojavayê Kurdistanê ji bo derxistina heqîqeta ku li qadê tê jiyan kirin, 3 endamên ragihandina Azad hatin armancgirtin. Li Bakurê Kurdistanê jî gelek caran kiryarên qetilkirin û girtina rojnamevanan taybet yên ragihandina Kurdî didom e. Ev tê wateya nepejirandina Kurdan û dengê rastiyê ye. Gelek caran Rojavayê Kurdistanê taybet li nûçeyên herêmên dagirkirî tên çêkirin sansûr an jî girtina rojnamevanan tê qutkirin. Dengê rastiyê yê ku em hezdikin bi cîhanê bidin eşkerekirin, didin qutkirin. Gelek welatên ku dibejin jî em demokrasiyê diparêzin li hemberî wan kiryaran jî bê deng in. Pêwist e saziyên mafên rojnamevanan diparêzin xebatên xwe xurt bikin û tawanbarên wan kiryaran bidin darizandin. Bêdengiya desthilata Başûrê Kurdistanê û Iraqê bêdengiya hemberî wan êrîşan peyama ku em dipejirînin dengê rastiyê bê qutkirin, didin raya giştî. Dibejin em nahêlin ku çapemeniya weke me nafikire li hêrêmên Başûrê Kurdistanê kar û xebatan pêş bixe. Ger jêrzemîna zagonî û mafparêziyê ji bona lêpirsina êrîşên wiha neye kirin, dê asta rojnamegeriya Kurdî ber bi qelsbûn û tinebûnê ve biç e. Mirov piştî wan êrîşan dibeje ji bona jiyankirina welatiyan jî ewlehî û aramiya Başûrê



Kurdistanê taybet jî herêmên di bin desthiladariya PDK’ê de, metirsiyê didin avakirin. Ji ber ku PDK azadiya rojnamevanan bingeh nagire û wan naparêz e.”

**‘Armanca êrîşê ne ten ê, Hemin Mamend bû, Ragihandina Azad tevahî bû’**

Lava bilêv kir ku ji ber ku Hêmin Mamend endamê Stêrk Tv bû taybet hatibû hilbijartin û wiha domand: “Hêmin Mamend pêşkêşvan û nûçegihanê Stêrk Tv bû. Civak giştî jî Stêrk Tv yê naveroka weşana wê nasdike û armanca weşanên wê ya ji bona xizmetkirina yekitiya gelê Kurd baş dizane û di şopîne. Ev jî sedemekê bingehîne ku pêşkêşvan Hêmin hat aramc kirin. Weşangeriya wê ya her çar parçê Kurdistanê jî li aliyê herkesê we tê dît in û temaşe kirin. Gelek caran navend û endamên Stêrk Tv hatine girtin û hewildan hîn jî berdewam in. Ji ber ku xebatê Stêrk Tv ji bona xizmeta Kurdistanê gelekî giring e û dijminên Kurdan wan kiryaran na pejirîn e. Divê ji ber wê PDK dema dibejê ez rêxistin û partiyekê doza Kurdistanî me, pêwîste helwest û bertekên xwe hembeî wan êrîşan bide nîşan kirin.”

**‘Pêwîst e qada rojnamgeriyê neyê astengkirin, bê pêşxistin’**

Lava Ibrahîm bang li saziyên navnetewî yên girêdayi mafên rojnamevanan kir û wiha axaftina xwe bi dawî kir: “Pêwîst e bi taybet karê rojnamevantiyê neyê astengkirin, ji bona pêşxistina wê divê alîkaî bê kirin. Ji ber ku ragihandin dengê civakê yê resen di hemû cîhanê dide guhdarkirin. Bi taybetî jî di weke doza Kurd û Kurdistanê bi sedan salan e bi pirsgrêke, rola ragihandina Kurdî hîn zêdetr dibe. Ji ber wê yekê hevalbendê Kurdan û welatên ku doza kurdî diparêzin, pêwîste alikariya Ragihandina Kurdî bikin. Ger ku partiyên dibêjin em Kurdin jî êrîşên wisa piştgrî bikin, doza Kurdî hîn serneketiye û dê têk biçe. Ji ber ku Ragihandina Azad, dengê Kurdistanê ye pêwîste bê piştgrî û parastin nemîn e. Divê saziyên mafên rojnamevanan hemberî wan kiryarên ku herêma Kurdistanê çêdibin bê deng nemîn in.”

# ‘Xîtaba nefertê û zimanê dijber dê şerekî navxweyî bi xwe re bîne’

**Navenda Nûçeyan**

**Endama Meclisa Sûriya Demokratîk MSD’ê Bêrîvan Hesen diyar kir ku li hemberî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê kampaniyên sîstematîk ji bo avakrina fitneyê di navbera pêkhateyan de çêbikin têne kirin û wiha got: “Gerek gel hişyar be ji ber ku xîtaba nefretê dê şerekî navxweyî bi xwe re bîne.”**

Di demeke hesas de ku Sûriyê di qûnaxeke avakirinê re derbas dibe piştî hilweşîna rejîma Baas, hin aliyên bê wijdan ji hêla hin dewletên ku dixwazin di Sûriyê de parçebûnê çêbikin, di riya kampaniyên sîstematîk ku hewildidin fitneyan di navbera pêkhateyên herêmê de çêbikin bi zêdekirina xîtaba nefretê û zimanê dijber li dijî pêkhateyan da ku aramiya herêmê xirab bikin û armancên xwe pêkbînin. Derbarê vê mijarê Endama Meclisa Sûriya Demokratîk MSD’ê Bêrîvan Hesen ji Rojnameya me re axivî û encamên van kampaniyan bi rûdana şerekî navxweyî nirxand eger hişyarî di nava civakê de tune be.

**‘Şoreşê li hemberî hişmendiya navendî destpêkir’**

Endama Meclisa Sûriya Demokratîk Bêrîvan Hesen di destpêkê de diyar kir ku piştî salên dirêj ji şêwazê hukimê yek reng, alî û netewî ku welat birêve dimeşand û encama vê hişmendiyê bû sersebebê ku şoreşek ji bo azadî û rûmetê li darket ku di dawî de jî ev rêjîm û pergala navendî bidawî bû û wiha berdewam kir: “Niha dîsa ji nû ve em dibînin ku desthilatdariya ku hatiye ser hukimê Sûryê dixwaze heman hişmendiyê berdewam bike. Bi israra hikumeta Sûriyê ya veguhêz li ser desthilatiyê dixwaze Sûriyê ber bi parçebûn û şerekî navxweyî ve bibe. Pêkhateyên Sûriyê bi salan bi kurd, ereb, suriyan û ermen û hwd.. bi hev re jiyan dikin, lê niha em dibînin ku hin aliyên girêdayî hin dewletên ku dixwazin Sûriyê parçe bikin, di riya destpêkirina kampaniyên belavkirina fitne û zimanê dijberiyê di navbera pêkhateyan de, ev jî bi sedema navendiya rengê deweletê ye ku tenê yek rengî qebûl dike. Sistema dewlet netew ji ber nijadperestiya ku dixînin navbera pêkhateyan de her dem zirarê dighînin gelan. Ji ber vê yekê jî gel li hemberî sîstemê heyî serî rakir û ev yek qebûlnekir. Konfiransa yekhelwesta pêkhateyan jî bersivekbû li hemberî hişmendiya ku dixwaze bi komkujiyan û şerê navxweyî sûriyê parçe bike û hemû pêkhateyan daxwaza sîstemekî nenavendî ji bona siberoja Sûriyê kirin.

**Erkê her kesî ye ku li hemberî zimanê gelan li dijî hev sor dike bisekine**

Endama Meclisa Sûriya Demokrat Bêrîvan Hesen wiha anî ziman: “Divê gel hişyar be ji planên ku li dijî pêkhateyên herêmê çêdibin, aliyên ku dixwazin fitnê çêbikin tenê dixwazin şerê navxweyî derxînin holê, ev mijar encamên pir xeter li ser herêmê wê bi xwe re bîne, li hember kesên ku zimanê dijber û xîtaba nefretê dike geleke em bisekinin, rêbazên teşhîrkirina ol, pêkhate, eşîre an mezheb em qebûl nekin. Li hemberî xîtaba nefretê em hêza xwe bikin yek û yekbûna helwesta xwe nîşan bidin û ev yek jî di riya konferansa yekhelwesta pêkhateyan de hate destnîşankirin ku bû bersiv ji bo tevahî dewletên ku dixwazin parçebûnê di nava Sûriyê de çêbikin.”

**‘Xîtaba Nefretê aloziyê kur dike’**

Bêrîvan Hesen tekez kir ku xîtaba nefetê û zimanê dijberiyê aloziyê kûrtir dike û riya çareseriyê dirêj dike û wiha got: “Em daxwaz dikin ku her kes bi deng û rengê xwe di nava Sûriyeke demokrartîk, nenavendî de jiyan bikin, herwiha nenavendiya siyasî û îradeya gelan derkeve pêş, da ku gel xwe bi xwe birêvebibe, nimûne Rêveberiya Xweser ya herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye ku di bajar û kantonên wê de gel xwe birêve dibe û ev nêzî 14 salin



ev şêwaz tê meşandin û encamên ber bi çav jî bi xwe re pêkanîne.”

Di dawî de ednama Meclisa Sûriya Demokratîk Bêrîvan Hesen der barê zêdebûna xîtaba nefretê de hişyarî kir ku ger ku li pêşiya vê yekê neyê girtin wê şerê navxweyî derkeve û wiha got: “Armanca van kampaniyên xîtaba nefertê û zimanî dijber ew e ku di navbera pêkhate û eşîran de pevçûnê derxînin. Em hêvî dikin Sûriyeke nû, nenavendî û bi demokrart ku tevahî pêkhateyên xwe hembêz bike, herwiha mafê gelê kurd û pêkhatyên din bi destûreke demokrat bê parastin û misogerkirin.”



# Sûc û hovîtî li Efrîna dagirkirî zêdetir dibin

Berpirsê Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Sûriyê Îbrahîm Şêxo diyar kir ku rewşa Efrînê ji berê xirabtir bûye û wiha got: “Kiryarên xirab li dijî şêniyan bi hemû awayan pêk tê, kesên vedgerin Efrînê îşkence li wan têne kirin û malên wan radestî wan nayên kirin."

**Jîn Hisên/Qamişlo**

Di çarçoveya binpêkirin û kiryarên xirab ên berdewam ku li dijî gelê kurd li Efrîna dagirkirî ji hêla çekdarên girêdayî dewleta Tirk a dagireker ve pêk tê û rewşa dawî ku li wir diqewime, Berpirsê Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Sûriyê Îbrahîm Şêxo ji Rojnameya me re axivî.

Îbrahîm Şêxo di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Kiryarên xirab û hovîtî li Efrînê berdewamiya binpêkirin, sûcên şer û dijmirovatiya 7 salên derbasbûyî ye ku ji hêla komên çekdar yên girêdayî dewleta Tirk ku bi Artêşa Wetenê têne naskirin tê kirin. Li ser rêbendên kontrolê hîna girtin û lêpirsîna gel tê kirin, bi taybet rêbenda li aliyê gundê Dêwa li navçeya Cindêrsê û Kûkanê li aliyê Babatê ku MÎTA Tirk û polîsên leşkerî yên hikumeta Demikî li ser disekinin. Cil û navê xwe veguherandine Ewlekariya Giştî lê heman binpêkirin û kiryarên xirab li dijî şêniyên resen ên Efrînê pêk tên, pirî caran xelk li ser van bendên kontrolê hatine û hîn têne girtin û revandin. Armanca wan daxwazkirina bacan li hember serbestberdana welatiyan.”

**Nivîsgeha Aborî bacan bi darê zorê ferz dike**

Ibrahîm Şêxo destnîşan kir ku nivîsgehên Aborî bacan li ser gelê ferz dike û wiha berdewam kir: “Di aliyekî din de nivîsgehên Aborî ya girêdayî komên çekdar weke Ehrara El-Şerqiyê li navçeya Raco bacan li şêniyan ferz dikin, berhemên mewsimê zeytûnan radestî xwediyên wan nakin heya girtina bacan, her-



wiha li ser mal û milkan bi giştî bacan digrin dikin. Koma çekdar a Hemzat jî li navçeya Raco, Şêrawa û deverên di bin kontrola wan de heta niha jî milk û malên şêniyên resen ku vegeriyan e Efrînê radestî wan nakin, tevî pêşkêşkirina giliyan li nivîsgeha Aborî, bi taybet piştî vekirina nivîsgehên Ewlekariya Giştî ku tu çareserî ji wan re ne danîn. Girêdayî kiryarên xirab ku têne kirin jî berpirsên Hemzat li gundê Şerqiyê, Ebila li navçeya Babilê, herwiha gundên derdora navçeya Şêra artêşa Nixbê bi hezaran darên Zeytûnan ên şêniyan destserkirine, radestî wan nayê kirin heta komkirina zeytûnan ji hêla van komên çekdar dibe ku teslîmî wan bikin, herwiha zêdeyî vê yekê jî gefan li xwediyên erdên zeytûnan dikin eger gilî bikin.”

**‘Li kêleka kiryaran aramî û ewlehî tune ye’**

Ibrahîm Şêxo destnîşan kir ku li kêlela kiryarên xirab rewşa ewlehî ne arame û wiha got: “Di danê êvarî de hin komên ne nas derdikvin êrişî ciwanan dikin û tiştên bi wan re didizin, rewşa ewlehî ji berê xirabtirbûye û gelek welatî bi vî awayî jiyana xwe ji dest dane, weke bûyera li gundê Hec Hesno ku ciwaneke bi vî rengî jiayna xwe ji dest da û kujerên wî nehatin muhasebekirin.”

Şîxo wiha domand: “Bi rûxandina rêjîma Esaad re, gelek kar û xebat hatin kirin ji bo başkirina rewşa welat herwiha vegera koçberan li warên xwe, weke rêkeftina 10’ê Adarê ku di navbera Fermendarê Giştî yê QSD’ê Mezlûm Ebdê û serokê Sûriyê yê demikî Ehmed El-Şeri ku hate îmzekirin, bendeke jê ji bo vegera koçberan li warê xwe bi awayekî ewle hatibû nivîsandin, da ku hikumeta veguhêz bibe alîkar di vegerandina deverên dagirkirî û komên çekdar ji hundirê Efrînê derxinîne. Piştre gelek civîn jî di navbera aliyên eleqdar de hatin çêkirin bi vê yekê moral û hêviyên koçberan mezin bû, lê mixabin roj bi roj ev rêkeftin paş ket û li ser erdê nehat pêkanîn, şandeya Rêveberiya Xweser jî li ser vê xalê sekinîn û bi desthilatdariya Şamê re danûstendin kir lê ya dawî tu gav ne avêt, lewma ev yek bû sedem ku gelê Efrînê koçber bimînin di nava kampan de li deverên cuda li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û rewşên wan pir xirab in.”

**‘Vegera koçberan ne bi ewle ye’**

Ibrahîm Şêxo bal kişand li ser vegera koçberan di dema heyî de û wiha got: “Girêdayî vegera koçberan di çarçoveya van kiryaran de ne bi ewle ye, îşkence li wan têne kirin herwiha gelek kes têne revandin û li hemberî berdana wan bace tê xwestin, ev kiryar ji her kesî re eşkere ye. Heta niha jî bi sedan ji ciwanên kurd li Efrînê çarenûsa wan ne diyar e. Hikumeta Şamê ya demikî hêza wê li ser erdê pir qelse ku tenê di warê axaftinan de ye û li gorî berjewendiyên dewleta Tirk a dagirekr tev digre.”

**‘Guman heye derbarê tevlîkirina ciwanan di nava Ewlekariya Giştî de’**

Berpirsê Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Sûriyê Îbrahîm Şêxo behsa tevlîkirina ciwanan di nava Ewlekariya Giştî de kir û wiha gotinên xwe qedand: “Hikumeta Şamê ya demikî hincetan derdixîne da ku xwe ji rêkeftina 10’ê Adarê vekişîne. Herî dawî jî li Efrînê berî çend rojan kampaniyek hate destpêkirin da ku ciwanên kurd tevlî ewlekariya giştî bikin di 19-20-21’ê Tebaxê de, li gorî agahiyên me ji hundirê Efrînê wergirt nêzî hezar û 100 kes tevlîbûne piraniya wan ji eşîreyên ereban e, ev yek jî ji ber rewşa hejarî û aborî ya zehmet e li wê deverê herwiha kêmderfeta kar li wir, şênî neçar dimînin tevlî bibin. Ciwanan îqna dikin ku ew ê parastina herêma xwe bikin, ji xwe guman di vê yekê de heye, gelo wê ev ciwan parastina ku deverê bikin û berê wan wê bidin ku deverê, pir mertirsî ji vê mijarê re heye ji ber ku berî niha jî dema dagirkirna Efrînê di 2018’an de ji şêniyan re gotin tevlî encûmenên xwecihî û şaredariyan bibin lê piştî tevlîbûna şêniyan piraniya wan hatin girtin, kuştin û dûrxistin û îro jî heman metirsî berbiçave. Mixabin hineke kurdên me jî di nava vê yekê de rol dilîzin û vê yekê rewa dikin, ciwanên kurd tevlî ewlekariya giştî ji bo ji raya giştî re eşkere bikin ku kurd herêma xwe îdare dikin, lê berovajî vê yekê ye, di demeke ku binpêkirin li dijî kurdên Efrînê berdewam e.”

# Heta ku serê Fîdan (Hakkan) li tehtê nekeve...

**Volqan Eli**

Di dema Osmanî de, siltanê li ser hikim artêşa xwe ji bo dizî û dagirkeriyê dişand welatên dûr û nêzîk. Vê artêşê çi welat û civak hebe, tarûmar dikirin û dihat. Ne ku qîma xwe bi diziyê dianîn. Zilamên wan dikuştin, erda wan dagir dikirin, dest diavêtên jin û keçên wan, zarokên kur bi xwe re dianîn (hin siltan û fermandarên mezin ên Osmanî bi xwe ‘yeniçeriyên devşirme’ bûn). Ew zarokên kur perwerde dikirin, ji civak, eşîr û fikra civaka wî dûr dixistin, wisa mezin dikirin û paşê dişandin ser welatê wî bi xwe da ku welatê xwe bi navê Osmanî dagir bike. Eger mayîbe dest biavêje xwîşk û dayika xwe (bi sedema di temenekî biçûk de Osmanî ew anîbûn ti kes nas nedikirin), welatê xwe, li ser navê siltanên Osmanî bişelîne. Dibe ku gotina wê ne xweş be lê bi Kurdî jêre dibêjin ‘bêjîkirin’, Osmanî leşker-mamûrên xwe bi piranî wisa çêdikir. Bi taybetî dîroka Osmanî bi vî karî bi nav û deng e. Di qada leşkerî de ji van kesan re digotin ‘yeniçeri’... kî ne Yeniçeri? ‘Bêjiyên’ serdemên dîrokî, leşkerên Osmanî...

Vaye ev kesê jêre dibêjin Hakkan Fidan jî, yekî wisa ye. Tê gotin ew Kurdekî ji Wanê ye. Derdê me ne ew e ku ji ku ye. Derdê me ew e ku ew çawa ‘Yeniçerîtiya’ Osmanî nûjen dike! Ji dayik û bavê wî dûr be gotina me, bi Tirkî jî jêre dibêjin pîç (bêjî), jixwe tiştê ku me bi nav kiriye, ‘bêjîbûna’ fikrî ye. Ji ber vê, gotina me ji dayik û bavê wî dûr diçe. Dibe ku ew ji aliyê dayik yan jî bavê xwe ve Kurd be lê tiştê dike ‘yeniçeritiya’ Osmaniyên nû ye, curekî ‘aşleyê’ ye (em naxwazin bêjin ‘bêjî’ ji ber ku bivênevê digihîje dê û bavê wî). Di hiş û serê wî de dijminatiya bi Kurdan (eger dayik û bavê wî Kurd bi wan re jî) re, dijminatiya bi gel û baweriyên mezlûm re heye.

Çi karî dike? Tu karê baş nake... ‘Yeniçeriyekî’ artêşa Osmanî çi kiriye, bi heman tiştî mijûl dibe. Radibe, rûdinî dibêje “QSD, Rojava, terorîst e, ji bo Tirkiyeyê gefeke mezin e”. Ma vê QSD çi kiriye? DAIŞ têk biriye, li dijî cîhadîstan bûye parazvanê gel û baweriyên li Sûrî. Ew çi karî dike? Ji cîhadîstan hezar rêxistinên terorîst ava dike. Zikê wan têr dike, bombe lê dipêçîne û dişîne li ser Kenîseyên Îsawiyan, dişîne li ser Elewiyên Peravê ku doza wan ji Kerbelayê maye, û Durziyan.

Van rojên dawî jî li herêmê û bi taybetî li başûrê Sûrî hin tiştên nû rû dan. Îsraîlê li ser navê parastina Durziyan û ewlekariya xwe dest bi hin tevgeran kir. Li hin hêzên leşkerî yên HTŞ ku dagirkeriya Tirk ew amadekarî kiribûn, da. Hin amûrên ku Îsraîlê dişopînin ên dagirkeriya dewleta Tirk, bê bandor kir (sê-çar rojan ji beriya vê).

Ti deng ji Fidanê min û te derneket! Dema dibêjim ti deng derneket, nabêjim nekir kûzekûz teriya xwe nexwest nava lingê xwe û ne çû li goşeyekî rûnenişt. Belê! Wisa jî kir. Lê negot “Ey Îsraîl, ey Emerîka tu yê hêza bi qehir (zordar) a dewlata Tirk bibînî”. Dîsa jî, divê mirov heqê wî jî nexwe. Rast e hin tiştên din jî gotin, wekî gazinc û lawayên xwe ji yekî bike, got: “Îsraîl dixwaze ewlekariya herêmê têk bibe. Tenê DYE’ê dikare pêşî lê bigire. Ew jî nagire”.

Dema min nû bihîstibû ku Hakkan Fidan Kurd e, min bawer nekiribû yan jî nexwestibû bawer bikim. Lê niha ti şikûgumana min nema! Dibêjin “heta ku serê Kurdan li tehtê nekeve, hiş û aqlê wan nayê serê wan”. Dibe ku Fidan jî ji hemû taybetmendiyên Kurdîniyê nikarîbûye xwe bişo. Gava ku serê wî li Îsraîlê ket, çû li ber rehma Emerîkayê!

**FENER**



## Divê Şam gurmikên xwe li ber dahola Tirkiyê neleqîne!

**Idrîs Henan**

Dewleta Tirk weke şoşban li herêmê tevdigere û di nava hewla ku qaşo hemû gav û rûdanên li herêmê li gorî vîna wê tên avêtin! Dixwaze derdora xwe wisa iqna bike ku tayên Rojhilata Navîn kontrol dike! Ev xwexapandinek mezin û heqîqet perovajîkirin e. Derdê wê yê bingehîn çavgirtin û kontrolkirina mejiyê hundirîn e. Ango; bi baweriya ku dibêje; li derve çi dibe bila bibe, reaksyon çi dibe bila bibe, lê divê mejiyê giştî li hundir li gorî planên min be. Yanê rê nade ti aliyek din mejiyek azad li gorî fikrên demokrat li ser bingehên edalet, wekhevî û pêkvejiyanê bête avakirin. Ji bona mayîndekirina desthilatdariyê û serketina hevrikiya talanî û diziyê, divê mejiyê ku dişopîne iqna bike û her binpêkirina wê rewa bibîne. Jixwe rejîmên Tirkiyê yên cihêreng, di bingehê xwe yê bîrdozî de hemfikir in. Tenê rêbaz û şêwazê xweîfadekirinê şiklekî nû dide wan. Lê jêder yek e.

Ger niha mirov çavekî li Sûriyê bixe, taybet piştî ku rejîma Baas a Beşar Al-Esad rûxiya, dê eserên dewletdariya Tirk ferq bike. Yanê dewlet û sîstemek homojen ku qet ferqa wê ji sîstema berê nîne di dewrê de ye. Desthilatdariya berê xwe weke fikrekî netewperest ê hişk û radîkal nîşand dida, ya îro jî weke wê ye lê aliyê xwe yê olperest li pêş e. Di pratîka herduyan de ti guhertinên bingehîn nînin. Bi heman şêwaz û rêbazê xwe didin jiyankirin. Herduyan jî pala xwe dane eznavedîbûneke hişk ku derveyî xwe kesekî din qebûl nake û bi rêbazên şîdet û zorê desthilatdariya xwe mayînde dikin. Lew re jî him dikujin, talan dikin, derevînin û desteser dikin û him jî bi bijardeyên teng ku pirrengiya li Sûriyê esas nagirin dest, hewl didin bi cil û çekên nû, rejîma Baas a rûxiyayî ji nû ve bivejînin. Bi gotinek din; li Sûriyê bi pêşengiya Tirkiyê tenê mizgeft û şêwazê nimêja serdestê dîktator hatiye guhertin. Di eslê xwe de heman jêderên fikir ên tund û tûjiyê ne. Ji ber vê jî, dema ku mirov li hal û rewşa Sûriyê piştî şanoya hilweşîna Al-Esad û çîroka serketina girûpek tundrew ku hîna li ser lîsteyên terorê ye binêre, mirov têdigihêje ku tenê nav û şikil hatine guhertin. Çawa ku desthilatdariya Baas nîv qernekî xwe mayînde kir û Sûriyê weke qufeka aborî û çêlekeke bişîr bi kar anî, rejîma îro ya HTŞ jî dixwaze rêbazên Baas ên destpêkê bivejîne û li gorî heman zihniyetê xwe bidomîne. Her difikire ku tişta bi kêrî Baas hatiye dê ji bona wê jî raçêtek di cih de be?! Yanî ji bona wê hêmanên zeman-mekan wek xwe ne û guhertina wan hîç wê têkildar nake! Zihniyetek wisa ye ku pirrengiya li ser bingehên demokrasî û misogeriya mafan nas nake. Ji ber vê jî ji itîfaqa 10 Adarê direve û dûv badide. Bê guman di nav xwe de nîqaş dikin ka çawa şimitîn û ew itîfaq îmze kirin?. Çawa ku Tirkiyê xwest pêşeroja xwe ji hemtayên xwe yên Rojhilata Navîn cuda bike û heman çarenûsê jiyan neke ku berê xwe da Îmraliyê û xwe avête bextê Rêber Ocalan, hikûmeta HTŞ jî li Sûriyê tûşî heman rêbazê kir ew dehfî deriyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir ku di encamê de itîfaqa 10 Adarê derket. Îro jî Tirkiyê û rayedarên wê hewl didin dûv badin û pêvajoya aşîtiyê asteng dikin, li Sûriyê jî HTŞ dehfî wê siyasetê dikin ku xwe pabendî itîfaqa 10 Adarê nebîne û ew jî dûvê xwe bade! Bi kurtayî, ji bo parastina yekparebûna axa Sûriyê, divê kesên li qesrên Şamê bi cih dibin, gurmikên xwe li ber dahola Tirkiyê neleqînin.